Kurdish

The **Children's** Service in **Haringey**

Pêşerojên Xweşhal/Ronî

Kurteyeke Stratejiya ji bo ciwanên 11-19 salî yên Haringeyê

www.haringey.gov.uk

HARINGEY COUNCIL

Pêşerojên Ronî stratejiyek e ji bo çêtirandina serketinên ciwanên 11-19 salî. Ew li çarmedorê pênc beşan tê organîzekirin:

- **Ciwan li Haringeyê**
- **Hînbûn û Hînkirin li Haringeyê**
- **Serokê Haringeyê**
- **Dêûbav û Civaka Haringeyê**
- **Xwendegehên Haringeyê**

"Vîzyona me ya serdest ev e ku hemî zarok û mirovên ciwan ên li Haringeyê dilşad, bisihet û bi ewle bin û xwedî pêşerojek xweşhal/ronî bin. Ev yek di nav vîzyona me ya perwerdeyê de jî xûya dike. "Di vîzyona me da xwendegehên serketî hene ku ew kêfxweş in ji ber ku baweriya civakên heremî bi wan heye; ew şansên jiyanê yên zarok û ciwanên heremî zêdetir dikin; ew dibin alîkar ji bo xweşhalî û bihevrebûyîna heremê û ew fayde digirin ji pevtêkiliyên potensiyel yên di nav paytextê de. Em niyet dikin ku standartan zêdetir bilind bikin û bidin garantîkirin ku hemî zarok û ciwanên me tên hundurandin. Em di wê baweriyê de ne ku ew, ji vê kêmtir, tiştekê heq nakin.**"**

Ji bo bidestxistina vê vîzyonê, em biryardarî û wêredariya xwe careke din dubare dikin ku em ê pir bixebitin ji bo afirandina hevpariyek xurt bi hemû kesên di nav civaka me de yên ku dixwazin zarok û ciwanên me bibin xwedî pêşerojek xweşhal.

Ji hertiştî zêdetir em dixwazin:

- di dawiya dawî de, xeleka di navbera dezavantajiyê û bidestxistinên radenizm de bişkînin ji bo afirandina civakên Sedsala 21'ê yên dewlemend ku kesekî li derve nahêlin û ku dikarin di nav xweşhaliyek de jiyanê bidomînin;

- destekê bidin xwendegehên navîn ku ew standartên bilindtirîn bi dest bixin, ku ew bi temamî herkesî bihundurînin, ku ew xwestek û serketinên xwendevanan daynin pêşiya hertiştê û ku ew bibin alîkar ji bo bihevrebûna civakê û wekheviya nijadê;

- encamên ji bo kes û grubên bêtavil veguherînin;

- xwendegehên navînê bikin xwedî hêz ku ew bikarin roleke sereke bileyizin di ji nû ve afirandina taxê de û di warî rojeva berfirehtir de ya ku destekê dide xweşhaliya ciwanan;

- alîkarî bidin hemî hevparên xwe yên ku di pêşeroja civanan de xwedî rolekê ne, ku em bi hev re, ji bo ku em ji bo ciwanan îmkanên herî baş bidin temînkirin, bixebitin;

- li xizmetên ku destekê didin ciwanan razandin/învestmint bikin.

Pêşerojên ronî li çarmedorê 5 beşên ku bi hev re ji bo guherîna transformasyonî dibin alîkar, tê organîze kirin.

Beş 1:
Ciwan li Haringeyê

Em cihêrengî, serketin, û polîtîqaya hundurandina (li derve nehêştin) ciwanên Haringeyê nas dikin û teşfîq dikin, lê belê, her wiha, em zehmetiyên wan ên mezinbûna di nav navçeyeke wiha cihêreng ya di nav paytextê de jî qebûl dikin. Em hewil didin ku ji bo pêşerojê pîlan çêbikin, bi riya destekdayîna ji bo ciwanan ku ew xwestek û armancên xwe û bidestxistinên xwe zêde bikin.

Her wiha, em hewil didin ku dengê ciwanan serdest bixin, wan teşfîq bikin ku ew bibin hemwelatiyên aktîf yên ku bi girtina biryaran re eleqedar dibin û bi awayeke erênî ji civakê re dibin alîkar.

Encam

•Bi riya Hevpariya Stratejîk ya Zarok û Ciwanan, divê em bidin garantîkirin ku xizmet firsend didin ciwanan ku ew bi sihet bin, di nav ewletiyê de bimînin, ji jiyanê hez bikin û di karên xwe de bi ser bikevin, ji civakê re alîkariyek erênî bikin û xweşhaliyek ekonomîk bi dest bixin. Bi taybetî jî, bi riya Desteya parastina Zarokan ya heremî, divê em bidin garantîkirin ku ciwan xwe bi ewle hîs dikin di nav xwendegehên me de.

• Divê em guh bidin nêrînên ciwanan ku em bidin garantîkirin ku em xizmetên xwe anegorê ihtiyacên wan dîzayn dikin, ku ev yek ji wan re bibe alîkar di riya ku ew xwe dighînin miradên xwe de û xwe ewle hîs bikin.

• Parlamentoyeke Ciwanan bê damezirandin û Serokekê ciwan bê hilbijartin ji bo belediyê ku ew ji bo hemû ciwanan firsetan teşfîq bike ku ciwan alîkariyeke erênî bidin civakê.

• Hevpariyek xurt bê pêşdexistin ji bo domandin û çêtirandina firsetên ji bo ciwanan û ji bo temînkirina îmkaniyetên/navgînên taybetî/pisporî yên herî baş.

• Civan bi awayek başţir xwe bikarin bighînin agahî, şîret û rêberiya serbixwe.

• Pere/çavkanî li Xizmeta Ciwanan ya Haringeyê bê razandin ku tiştên ew pêşkêşî ciwanan dikin xurttir bibe.

• Ciwan bi awayek êpî zêdetir xwe bikarin bighînin ICT, ku ew bibin xwedî tewbariyek zêdetir di warî ka ew çawa hînbûna xwe pêk tînin û ku ew xwe bighînin cûrbecûr agahiyên berfirehtir ku ew bikarin bi zanebûn biryarên xwe bidin.

• Zêdetir firsend bên dayîn ji bo ciwanan di warî huner û sîporan de ku ew bikarin ji firsendên ku ji wan re di nav paytextê de vekirî ne, bi awayek tam berjewendiyê bigirin.

Beş 2:
Hînbûn û Hînkirin li Haringeyê

Em dixwazin mûfredatek zindî biafirînin ku ew bala ciwanan bikşîne û bibe sebeb ku ew mereq bikin û bibin hînkerê xwe bi xwe-motîvebûyî; ku ew bixwazin bibin xwedî zêdetir hînbûn û bidestxistinan û bibin xwedî çavkaniyan ku ew xwendin/hînbûna xwe, bi xwe beralî bikin.

Ji bilî vê, em dixwazin hêzeke pir-motîvebûyî û zana/pispor ku îlham dide ciwanan, û afiranderiya wan pêşve dibe û hînbûna wan teşfîq dike, damezirînin.

Encam

• Ciwanên Haringeyê li pêşiya transformasyona hînbûnê bên bicîhkirin, bi riya bicîhanîna ihtiyacên wan ên cûrbecûr. Ev yek jî, bi riya metodên cihêreng ên afirander ku zêdetir bikaranîna wan ya ICT jî dihundurîne, bê pêkanîn.

• Xebatên afirender dest pê bikin di heman dema ku xwendevan ji merhela destpêkê derbasî merhela navînê dibin ku bê garantîkirin ku hemû ciwan di nav salên ewil de yên li xwendegehên navînê pêşdeçûneke mikemel bi dest bixin.

• Fleksibîlîteyên mûfredatê bên firehkirin ji merhela sereke 4 an heta merhela sereke 3 an, bi taybetî jî ji bo xwendevanên ku di nav rîska neserketinê de ne, û ji bo xwendevanên xwedî serketinên bilind îmkan bên dayîn ku ew zûtir bên qeyd/qebûlkirinên û serketinên wan jî zûtir bi awayek resmî bên qebûlkirin.

• Îmkan û ciyên ji bo perwerde û hîndekariya 14-19 saliyan bi awayek cidî bên berfirehtirkirin, ku zêdetir ciwan îlham bigirin ji tiştên ku ew hîn dibin û bibin xwedî xwestek û perwerdebûna xwe ya piştî sal 16, bidomînin, an bidestxistina hîndekariyek kêrhatî an dîtina karekî garantî bikin.

• Bi riya xwendegehên îmkanên wan zêdekirî, xwendevan xwe bikarin zêdetir bighînin firsetên hînbûna li derveyên seetên xebatê, bi taybetî jî, ji bo ciwanên ku li mal xwedî çavkaniyên pir bisînor in.

• Di nav programeke firsetên berfirehtir yên ku serê wê, ji aliyê Olîmpiyata sala 2012 an ve tê kişandin de, bi bikaranîna Sîpor û Hunerê eleqa xwendevanan di warî hîndekariya karbendî de bê domandin.

• Bi serokatiya ekîbeke profesyonel ya di nav her xwendegehekê de, ku di warî hînbûn û hînkirinê de, ji bo mikemeltiyê, xwendevanan dike xwedî hirs û ji wan re dibe mînak û wan teşfîq dike, Haringeyê bibe navendekê mikemeltiyê ji bo girtina ji bo îş ya xebatkaran, domandina xebata wan a li Haringeyê û pêşdeçûna profesyonel ya ji bo hemû xebatkaran.
• Ji bo transformasyona hînbûn û hînkirinê ICT bê bikaranîn.

Beş 3:
Serokê Haringeyê

Em dixwazin serok û menecerên wisan mezin bikin ku, ew di klasa dinyê (world class) de dibin xwedî armancên watedar yên exlaqî; ku, li derveyî sînorên xwendegehê, dikarin roleke civakî bigirin li ser milê xwe; ku dikarin bi stîleke hevalbendiyê serokatî bikin ku derfet dide yên din û hevkariyên xurt ava dike.

Encam

• Haringeyê bibe navendeke mikemeltiyê di warî pêşdeçûna serokatiya xwendegehê de.

• Serokatiyek civakî ya xurt ku di warî teşfîqkirina yekitiya civakî û wekheviya nîjadî de xwedî roleke zelal e, bê damezirandin.

• Xwenirxandina xwendegehê û ji nû ve berçavan re derbaskirina hevaltiyê/hevûmirtiyê bê xurtkirin ku serokatî di hemû sewiyan de bibe xwedî nêrîneke saxlem di derbarî pêşveçûna her ciwanekê de û ka ihtiyacên wan çawan bi cîh tên anîn.

• Forumeke 11-19 saliyan bê damezirandin ku ew hesabê bide hemû mirovên ku bi pêşeroja civanên li Haringeyê re eleqedar dibin.

•Awayî ku ICT, ji bo desteka rêvebiriya xwendegehê, tê bikaranîn were veguherandin û bi civaka firehtir û bi dinyaya firehtir re pevtêkilî bên çêkirin.

Beş 4:
Dêûbav û Civaka Haringeyê

Em dixwazin hevkariyê teşfîq bikin bi dêûbav/nêrevanan re bi riya perwerdekirina serketî ya ciwanan û bi riya çêkirina têkiliyên xebatê yên xurt yên bi civak û organîzasyonên heremî re.

Encam

• Ji dêûbavan re destek bê dayîn ku ew bikarin biryaran bigirin, hîn bibin, xizmetên perwerdeyî pêşkêş bikin û bibin serokên xwendegehan.

• Pratîkên herî bi tesîr bên domandin û li wan îlawe bên kirin ji bo teşfîqkirina dêûbavan ku ew bi xwendegehan re eleqedar bibin.

• Bi riya xwendegehên ku zêdetir îmkan didin, hînbûna malbat û yên kesên mezin bê teşfîqkirin.

• Dêûbav cîh bigirin di nav gelek foruman de ku ew bikarin bibin alîkar di nirxandina xizmetên me de ku ev yek xwendegehan jî dihundurîne, û bibin alîkar ku em bidin garantîkirin ku em ihtiyacên zarokên wan bi cîh tînin.

• Dêûbav bibin destek ji xebata xwendegehên zimanê yên civakê re, beşdarbûna wan ya di nav forumên ji bo 11-19 saliyan jî di nav de.

• Bê garantîkirin ku hemû ciwan û malbatên wan dikarin xwe bighînin agahî, şîret û rebêriyeke serbixwe yên bi qalîtyeke bilind. Divê ku ev yek şîreta di derbarî kariyerê de jî bihundurîne ku ciwan bikarin bizanebûn qerar bidin ka perwerde an xebata ku ew dixwazin çi ne.

• Di nav her xwendegehê de, bi riya dirêjkirina/firehkirina xizmetên xwendegehê, dêûbav û civak bi awayek zêdetir bikarin xwe bighînin îmkaniyetên hînbûnê.

Beş 5:
Xwendegehên Haringeyê

Em dixwazin pêşdexistina di warî binesazî, organîzasyon û hawîrdora xwendegehan de bidomînin ku ew bikarin bibin destek ji hînbûna bîçîmguher ya Sedsala 21'ê re.

Encam

• Heta Îlona 2007 an, navendeke nû ya forma şeşan (sixth form centre) bê avakirin.

• Ji bo veguherandina dayîn û bikaranîna ICT, lêrazandineke zû û cidî bê kirin.

• Ji hemû xwendegehên navîn re îmkan were dayîn ku ew xizmetên dirêjkirî/firehkirî bidin.

• Li xwendegehên navçeyên rojhilat, formên qebûlkirin/qeydkirinan bên kêmkirin ku ew bi awayek başţir bersîv bidin ihtiyacên kompleks yên ciwanên ku ew ji bo wan xizmetê didin.

• Dest bi avakirina xwendegehên 'ji bo serketinê pêdiviyên sereke' bên kirin û kampûseke hînbûnê ya ku hemû kesan dihundurîne bê avakirin.

• Hemû xwendegehan têxin nava merheleyên paşî yên programa BSF.

• Xwendegeheke nû bê avakirin û ew di Îlona 2009 an de bê vekirin ji bo xwendevanên sal 7.

• Hemû xwendegeh heta 2008 an bibin xwendegehên navîn yên gelemper.

• Ji bo xwendevanên xwedî rewşa spektruma otîstîk, bi xwendegeheke navînê re girêdayî, tedarikên/îmkaniyetên têrçavkanî bên amadekirin.

• Di nav xwendegeheke navînê de, hawîrdoreke hînbûnê ya xurtkirî bê amadekirin ji bo xwendevanên ku çavên wan nabînin an kêm dibînin.

• Di nav xwendegehên navînê de, ûnîteyên destekê bên avakirin ku ew îmkan vekin ku bi hejmarek zêdetir xwendevanên xwedî zehmetiyên sosyal, dilînî, û halwestî bikarin ji saziyên cûrbecûr destekê bigirin.

• Tedarik/desteka ku aniha li derveyî xwendegehê ji bo xwendevanên xwedî zehmetiyên dijwar û kompleks yên sosyal, dilînî, û halwestî tê dayîn bê pêşdexistin ku di radeyek bilind ya pisporiyê de xizmet bên dayîn ji bo xwendevanên ku hejmarên wan kêm in.

• Hejmara pisporan û deverên pisporiyan bên zêdekirin di nav xwendegehên navîn ên Haringeyê de û îmkanên wan bi xwendegehên din re bên parvekirin.

• Heta du xwendegehên hîndekariyê bên avakirin ku ew hîndekariya ewil ya mamostetiyê û pêşdeçûna profesyonel ya domdar temîn bikin.

• Navendeke nû ya ciwanan bê vekirin û navendek jî ji bo xelata Dûkê Edinburgh bê vekirin.

Ji bo em destekê bidin van pênc beşan, pîlanên me yên bi kitekit hene ji bo van deverên pratîk û polîtaqayên jêrîn:

•Hedef û sewiyên bidesxistinên vê demê

•Mûfredatê li ihtiyacên ciwanan anîn

•Serîderenîn bi performansên nebaş re

•Her Zarok Mûhîm e: Guhertin ji bo Zarokan

•Hundurandin

•Temînkrina xizmetên cûrbecûr ji aliyên xwendegehan ve

•Teknolojiya komûnûkasyon û agahiyê

•Ji nû ve bişikilkirin û Domandina Pêşdeçûna Profesyonel

•Qapasîteya serokatiyê di nav Haringeyê de

•Şanîderên performansê, çavdêrî û nirxandin

Haringey xwedî vîzyon û îstîqameteke zelal e û xwedî serokatiyek xurt û havparên biryardar e. Me dest bi bernameyek girîng kiriye ji bo guhertinê. Em xwedî wêredarî û biryardariyê ne ji bo bidestxistina armancên xwe ku em astengiyên li ber serketinê ji holê rakin û encaman veguherînin ji bo zarok û ciwanên ku em ji bo wan xizmetê didin.

Qopyên vê kurteyê û /an weşan bi temamî dikare ji li vir bi dest bê xistin:

Wendy Quildan or Thelma Austin
General Office
1st Floor
48 Station Road
Wood Green N22 7TY

020 8489 3893 / 3238

an email: wendy.quildan@haringey.gov.uk or thelma.austin@haringey.gov.uk

www.haringey.gov.uk/brightfutures

Xizmeta Zarokan
Kanûn 2005
© Haringey Council 2005